

# Ji dagirkerî û qirkirinê re na! Emê jin û jiyane biparêzin

Daxuyanî ji bo raya giştî

Dewleta Tirk ji despêka aloziya Sûriyê ve rola herî xerab ji bo dirêjkirina temenê aloziyê list û destwerdana wê bandoreke mezin li ser guhartina rêveçûnên siyasî û leşkerî li ser rûyê erdê kir. Bi vî awayî vegera çavbirçibûna osmaniyan li ser axa Sûriyê ji bo pêkanîna berjewendiyên wan ên stratejîk eşkere bû.

Bi rêveçûna buyeran re diyar bû ku dewleta Tirk ji rewşa Sûriyê ji bo xwe bikar anî û di nava hêzên ku ev alozî afirandine û kûr kirine de bû.

Dewleta Tirk ji destpêka aloziya Sûriyê 15 Adara 2011`an ve destwerdana karûbarên Sûriyê kir û bi demê re rêbazên destwerdanê hatin guhartin. Her wiha dewleta Tirk bi erêkirin û lihevkarîna hin dewletên rojava ji bo piştgiriya hin komên terrorist li dijî Serê Kaniyê û Kobanê 2012`an Sînorên xwe weke deriyên derbasbûna mûxalîfên normal û yên tundrew vekirin.

Her wiha di hemû kongre û lêgerînên ku ji bo çareserkirina aloziya Sûriyê yên weke kongreyên Cinêv, Soçî û Asîtana hatine lidarxistin rola herî xerab list û bi rêya van kongreyan dewleta Tirk bi behaneya herêma kêmkirina şer dest danî ser gelek herêmên Sûrî. Ev jî di bin navên cuda de rengekî ji dagirkeriyê ye û ev herêm bû cihê komên terotîst ên çekdar û baregehên perwerdeyên di bin parastina dewleta Tirk de.

Ji bo temamkirina rola Tirkiyê ya li dijî gelê Sûrî, hêzên Tirkiyê yên dagirker di bin navê cuda yên weke Diri El-Firat, Xusun El-Zeytûn, Nebi El-Selam ku bajarên Bab, Ezaz, Cereblûs, Efrîn, Girê Spî û Serê Kaniyê dagir kirin de gelek operasyonên leşkerî dest pê kirin û ev operasyon di bin perdeya Rûsî ku Tirkiyê û Rûsyayê diparêze û berjewendiyên wan pêk tîne de bi rêve çûn.

Êdî têkiliyên dewleta Tirk a dagirker bi komên çete re ku ew bi hemû navên wan bikar anîne û di aliyê navnetewî de jî di listeya terorê de ne, nayê veşartin. Nexasim komên ku di destpêkê û hemû aliyên de piştgiriya wan kiriye û hîna jî dike Cebhêt El-Nusra û DAİŞ in. Her wiha hin komên din ku yekser di bin çavdêriya dewleta Tirk de hatin damezîrandin ku li wan herêmên ku dagir kirine siyaseta tirkîkirinê, qirkirina nijad û çandî, guhartina demografîk û koçberkirina bi dare zorê meşandin. Li aliyekî din van komên çete yên terorîst sûcên weke kuştin, destdirêjî, talan, dizî, wêrankirina şûnwaran, hilkirina daran û şewitandina erdên çandiniyê pêk anîn.

Ev êrişên hişmendîya zayendperest ku ji aliyê rêjîma zîlamên desthilatdar ve pêk tên jinê hedef digire da ku hewildana jinan ya ber bi azadiyê ve sînardar bike. Em rojane li ser asata cihanê şahidiyê ji van buyerên ku şewazê wan li gorî her welatekî tê guhartin re dikin. Ev rêjîma ku hebûna jinê hedef digire û bi hedefgirtina jinê, hewil dide metirsiyê li ser civak û xwezayê ava bike.

Herêmên me jî dibin şahidên van sûcên ku divê werin bibîrxistîtin û bi taybet tundi û kiryarên li dijî mafê jinan ku jinê pê re rû bi rû dimînin. Destdirêjî, kuştin, dîlgirtin, revandin, bikaranîna jinan bi rêbazên herî xerab, qirkirina wan, şikandîna îradeya wan û têkbirina têkoşîna wan. kiryarê kuştina şehîd Hevrîn Xelef, Yadê Eqîde, pêlîstina cenazeya şehîd Amara û gelek kesên din ku dagirkeriya Tirk û çeteyên wê bi sûcên herî xerab di derbarê wan de kirine û herî dawî jî hedefgirtina şehîd Zehra, Hebûn û Dayê Emîne li gundê Hilincê yê Kobanê hîna jî li ber çavên me ye. Ev operasyonên hedefgirtina jinên çalakvan di warê rêxistinî û siyasî de lêdana koma Tevgera Rizgariya Jin û rêxistinên girêdayî wê ne. Ev şewazên hovane tekez dikin ku dewleta Tirk ji rola ku jin ji bo pêşengtiya şoreşê û parastina destkeftiyên dilîze, ditirse.

Dagirkeriya dewleta Tirk li ser hin herêmên axa Sûriyê û gefxwarina hin herêmên din yên nû ji bo ewlehiya herêmê metirsiyê çêdike. Dibe ku karîseyeke mirovî ya nû li Sûriyê pêk bîne, bi taybet piştî ku çekên di navnetewî de qedexekirî ji bo kuştina gelê Sûrî bikar anî û wêrankirina xaka Sûriyê zêde kir, hîna jî bermahiyên xerabkirin û talankirinê xelas nebûne. Li aliyekê din jî = hewildana lêdana jiyana hevbeş û aştîyane ya di navbera Kurd, Ereb, Suryan, Asûr, Keldan, Tirkman, Çerkes û Êzîdî de ku nûnertiya projeya Neteweya Demokratîk dikin, bû.

Divê em der barê xeteriya dewleta Tirk de baldar bin, divê rê li pêş sûcên wê yên gefan li azadiya jin û destkeftiyên şoreşê dixwin, bigirin da ku şer û komkujî pêk neyên.

Êrişên dewleta Tirk, derbeya mezin li jiyana hevbeş a di navbera gel, etnik û çandên li Sûriyê de ye, her wiha têkbirina projeya çareseriya siyasî ye, ya ku aramî û ewlehiyê li Sûriyê li ser esasê jiyana hevbeş a azadiya di navbera gelên Sûriyê de bi kar tîne. Her wiha dewleta Tirk bêdengiya navneteweyî ya ji hêla NATO'yê ve derfet digire û berjewendiyên xwe pêk tîne. Bi wê re jî ji DAIŞê xeterantir e.

Bi kurtasî, sûcên ku dewleta Tirk û çeteyên wê li dijî gelê Sûriyê li ser xak û bajarên Sûriyê pêk tîne dikevin xaka sûcên şer û sûcên dermivî, ji qirkirina etnikî, qirkirina komî, koçberkirina bizorê û guhartina demografî. Bi wê re jî divê bi lez an dereng dewleta Tirk were muhasebekirin û darizandin.

Em îro, rêxistin, tevger, yekîtî û sazîyên jinan vê hemeleyê ji bo sekna li hember dewleta Tirk têkildarî fikra qirkirin û dûrxistina bi mafên jinan û gel dest pê dikin. Da ku dengê xwe bigihînin tevahî cihanê.

Li aliyekî din jî, çer ku jin hê jî di bidestxistina maf û parastina rûmeta xwe de tê dikoşin, piştrast dikin ku dê tevahî hewldanên dewleta Tirk bi bin kevin. Bi yekîtî û piştgiriya jinan ji hev re dê hêza xurt bê avakirin û li hember tevahî hewldanên qirkirin, dûrxistin û nijadiyê bisekin û dagirkeriyê têk bibin.

Di hemleyê de gelek çalakî û xebat hene ku dê li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê bîn belavkirin.

Bang li rêxistin û sazîyên navneteweyî yên peywendîdar dikin ku ji bêdengiya xwe ya şermînî li hember sûcên li Bakurê Sûriyê dibin derkevin, roleke aktîf bilîzin, li gorî rêgez û qanûnên hiqûqî, mirovî û exlaqî tev bigerin. Ji ber her bêdengî nîşaneyê beşdariya dijminatîyê ye.

Bang li rêxistin û sazîyên navneteweyî yên peywendîdar, bi taybet ên girêdayî parastina mafên mirov û mafên jinan, dikin ku bi rola xwe ya der barê belgekirina sûcan rabin û sûcdaran muhasebe bikin.

Bang li Konseya Ewlekarî û civaka navneteweyî dikin ku dewleta Tirk neçar bikin ku hêzên xwe yên êrişî xaka Sûriyê kiriye bikişînin û êrişên xwe rawestîne, ji ber ku bînpêkirina qanûna navneteweyî ye û gefan li ewlehî û aramiya herêm û cihanê dixwe.

Bang li tevahî rêxistin û tevgerên jinan ên li ser asta cihanê dikin ku piştevanî û piştgiriya şoreşa jinan bikin ji ber destkeftiyên wê destkeftiyên tevahî jinên cihanê ye. Ji lew re dive parastina vê şoreşê bê kirin, her wiha parastin û piştevaniya QSDê, YPG, YPJ û HSNBê bê kirin, ji ber van hêzan ji ber cihanê ve şerê mezintirîn hêzên tarî li cihanê kir û mirovahî ji şerê wê parast.

Komîteya Amadekar

08.10.2020

Kongra Star  
Meclisa Jinên Sûriyê  
Yekîtiya Jinên Suryanî  
Kordînyasyona Jinan a Rêveberiya Xweser  
Miclisa Jinan a Bakur û Rojhilatê Sûriyê  
Nivîsgeha Jinan a Partiya Sûriyê ya Pêşerojê  
Nivîsgeha Jinan a Meclîsa Sûriya Demokratîk  
Nivîsgeha Jinan a Tevergera Civaka Demokratîk  
Yekîtiya Jinên Ciwan  
Rêxistina Sara Tekoşîna Tundiya Ser Jin  
Tora Rêveberên Aştiyê  
Navenda Lîkolîn û Parastina Mafê jinan li Suriyê  
Rêxistina Mafê Mirovan  
Rêxistina Însaf ya pêşveçûnî  
Rêxistina Elyasmîn  
Komperatîfa Sawoşka ya Jin  
Rêxistina Aşna ya pêşveçûnî  
Rêxistina Ferat ya Alîkarî û pêşveçûnî

Navenda Edil Ya Mafê Mirova  
Komperatîfa Dicle ji bo Parastina Eykolojiya  
Navenda Belsem Ya Fêkirina Tendrustî  
Komperatîfa şemal ya mirovhezî ya Alîkarî û pêşveçûnî  
Rêxistina cezîrê ya pêşveçûnî  
Rêxistina Erd El Selam  
Rêxistina kobanê ya Alîkarî û pêşveçûnî  
Rêxistina hêvî ya Alîkarî û pêşveçûnî  
Komperatîfa Soz ya Alîkarî û pêşveçûnî  
Rêxistina Eta Elbaxoz ya pêşveçûnî  
Rêxistina Sewaad ya pêşveçûnî Li Dêr El zor  
Rêxistina Forma Du Ceman  
Dan Ji Bo Alîkarî û pêşveçûnî  
Rêxistina Terahum ya pêşveçûnî  
Rêxistina Doz Ya Civaka Sivîl  
Komperatîfa Sibe Xweşe ya Alîkarî û pêşveçûnî  
Komperatîfa Maya  
Komperatîfa Nûr Can Li Amudê